



26.03.2021

Agahî ji bo dêûbavan

yên ku zarokên wan li zarokxane an li cihên mêzekirina zarokan tên mêze kirin

Agahî ji bo ragir, birêveberî û xebatkarên

zarokxane û navendên mêzekirina zarokan

Piştî Cejna Paskalya di zarokxaneyê de mêze kirina zarokan

Mêze kirina rojane ya zarokan li Nordrhein-Westfalenê dê piştî Cejna Paskalyê jî di bin şertên tengkirî de bi awayekî rekûpek bidome, di destpêkê de herî kêma heya 11ê Avrêl 2021.

Hûkmên talîmatnameya li ser mêze kirina di dema koronayê de (Coronabetreuungsverordnung) hîn muteber e, yanî divê di navbera kesên gihayî de herî kêma 1,5 metre mesafe hebe. Eger girtina mesafeyî herî kêma ne mimkûn be, divê kesên gihayî bi maskeyek tîbbî li ser dev û pozên xwe bigrin. Divê tedbîrên guncan ên paqijiyê werin girtin û îmkana şopandinê were bi cih anîn.

Ji bo zarokxaneyan nuqtayên jêrin muteber in:

- Divê li her derê eyaletê de cûdakirina koman pêk were, yanî odêyên sabît tehsîs kirî, kesên sabît (her tim eynî zarokan) û bi gelemperî xebatkarên sabît.

- Ji bo bi cih anîna cûdakirina koman li her derê eyaletê de çarçoveya mêze kirinê di zarokxaneyan de ji bo her zarok bi heftekî 10 saet ve tê sînor kirin. Heya ku çavkaniyên xebatkarên têkîldar vê yekê dihêlin û barlêbûnek zêde ya rewşa giştî li zarokxaneyê nikare were holê, wê demê bilind kirina çarçoveya mêze kirina mimkûn bibe. Zarokxanê an jî ragir li ser vê şeqlê têkîldar biryar dide.

Ji bo mêzekirina zarokan nuqteyên jêrin muteber in:

- Di mêzekirina rojane ya zarokan de zarok li gor peymana mêzekirinê qasî çarçoveya dema tîn mêze kirin. Di mêzekirina zarokan ya kollektîf de, gorî îmkanan divê ji bo xebatkarên mêzekirinê tev bi zarokan ku ji wan re hatine veqetandin ji bo tevahiya dema mêzekirinê ya rojanê odêyên cûda werin amade kirin.

Mijûlbûna bi nîşanên nexweşiyê:

Prensîp ev e: Zarokên nexweş ne aîdê zarokxane ne jî navendên mêze kirina rojane ne! Divê zarokên ku li gor dêûbav û zarokxane an navenda mêze kirina rojane nîşanê nexweşiyek akut, enfeksiyonî û vegirtî didin, nên mêze kirinê. Di vê nuqteyê de, carek din bi eşkereyî bang li dêûbavan tê kirin ku ji bo parastina xebatkarên, karmendên navenda mêze kirina zarokan û zarokên din di bin vî rewşa de zarokên xwe nêynin zarokxaneyê. Di bin vî rastîyê de her wiha hîn muteber e ku zarokxane an xebatkarên navenda mêze kirina rojane dikarin mêze kirina zarokan red bikin, heya ku ev bixwe difikirin ku zarok nîşanên nexweşiyê didin yê ku rê li ber mêze kirinek bi berpirsyarî digirin. Di rewşa sermarakirinê de bêyî ku bêtir nîşanên nexweşiyê hebin, divê zarok, wekî berê, 24 saetan li malê werin temaşekirin. Eger nîşanên din çênebin, zarok dikare dîsa were navenda mêze kirinê. Pêşniyarên li ser mijûlbûna bi nîşanên nexweşiyê li cem zarokan divê bi domdarî û hevgerî bibe sepandin.

**Wezaretê Zarok, Malbat, Penaber û Entegrasyonê ya
Eyaleta Nordrhein-Westfalenê**